



Wezaretê Perwerdehiyê ya NSW

Serlêdana ji bo ku zarokê min beşdarî dersa derfetê an lîseyê bijarte bibe

Çima perwerdehiyê bijarte?

Berhevkirina xwendekarên jîr û jêhatî bi hev re û bikar anîna rêbazên hînkirina taybet, piştgiriya wan dike:

- pêşketina akademîk
- Tendirûstiya hestiyarî; û
- Hevaltî û jiyana civakî.

Xwendekar ji me re dibêjin ku gava hevalên wan ên polê xwedî şiyar û berjewendiyên wekhev bin, ew ji hînbûna zêdetir kêfê distînin.

Ji bo zarokê min rast e?

Li vir hin nîşan hene ku zarokê we dikare ji perwerdeya bijarte sûdê werbigire.



Bi lez û bez hîn dibe



Hankirîbûn



pirsên aloz dipirse



bîreke baş



Meraqdar û afirîner



Bi kûrahî berjewendiyên vedikole

Ji bîr nekin, dibe ku hin potansiyela zêde ya zarokan were veşartin. Di dersa firsendê da an jî lîseyê bijarte dikare bibe alîkar.



Ez çawa dikarim bi pêvajoya sepanê destekê bidim zarokê xwe?



Bi zarokê xwe re li ser **sûd û zehmetiyên** perwerdeya bijarte bipeyive û pirs û fikarên xwe bînin ziman.



Ji **mamosteyê zarokê** xwe bipirsin (an jî xebatkarên din ên ku wan baş nas dikin) bifikirin ku perwerdeya bijarte dê li gorî zarokê we be yan na.



Ji bo seqetî an jî rewşên tibî ji bo **sererastkirinên** maqûl yên pêwîst serî lê bidin.



Zarokê xwe teşwîq bikin ku ji bo amadekirina testê **çavkaniyên belaş** ên beşê bi kar bînin.



Bînin bîra zarokê xwe ku ji bo testa bicihkirinê pêdiviya wan bi **amadekarîyeke biçûk** heye û pêdiviya wan bi perwerdeyê tune ye.



Ji bo berdewamkirina çalakîyên **derveyî sinifê**, dîtina hevalan, bi tenduristî bixwin û di dema testê de baş razên, piştgiriye bidin zarokê xwe.


Modela Bicihkirina Edaletê, ji bo yên jîr û jêhatî, **20 ji sedî ji cihên** dersên derfetê û lîseyên bijarte vedihewîne:

- Xwendekarên ji paşmayên kêr-civakî-perwerdeyî
- Aborjîn û / an xwendekarên Torres Strait Islander
- Xwendekarên ji cihên gundî û dûr
- Xwendekarên astengdar.

Zêdetîr hîn bibe:

edu.nsw.link/equity

<https://education.nsw.gov.au/public-schools/selective-high-schools-and-opportunity-classes/general-information/translated-resources>



Alîkariya darayî

edu.nsw.link/pubedu

[Public Education Foundation scholarships](#) ji bo alîkariya ciwanên li dibistanên giştî yên NSW ji bo xwegihandina derfetan û gihaştina imkaniyatên xwe, alîkariya darayî pêşkêş dike.

Ji kerema xwe ji bîr nekin ku ji bo sepanê û testa bicihkirinê ti xercên dibistanê nînin û ji bo qeydkirina lîse yan jî darsa derfetê ya bijarte tu xercên dibistanê tune ne.

Ji bo serlêdanê xwe amade bikin

Di malpera me de agahiyên zêdetir bistînin



Servîsa wergerandinê ya telîfonê

Heger pêdiviya we bi alîkariya wergêran hebe ji bo ku hûn bi mamosteyê pola zarokê xwe re biaxivin, ji kerema xwe di 131 450 de li Xizmeta Wergerandina Telîfonê bigerin û bi zimanê xwe wergêrekî bixwazin. Ji operatorê re hejmara telîfonê ya ku hûn dixwazin lê bigerin bibêjin û ji bo ku di axaftinê de bibe alîkar wê operator li ser xetê wergêrekî bistîne. Ev xizmet belaş e.

Parents applying for selective education - Kurdish Kurmanji 2

education.nsw.gov.au/shs-oc